

Mela Ehmed Rehîmî:

Di pêvajoya vê xebatê de, hejmarek ji baştirîn xortên hizb û gel, me pêşkêşî baregeha azadiyê kirin

»»» R:3

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (323) 04-04-2018 Buha (1000) Tûmen

Peyama sersaxiyê ya PDKÎ ji bo Nêçîrvan Barzanî



Kurdistanmedia: Derheq koça dawiyê ya Dilovan Barzanî birayê Nêçîrvan Barzanî, PDKÎ peyameke sersaxiyê belav kir

Deqa peyamê weha ye:

Birêz kek Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Herêma Kurdiatanê

Tevî rêz û silavan

Nûçeya koça dawiyê ya birayê we rêzdarî, rehmetî kek Dilovan Îdrîs Barzanî cihê xem û kovana me bû. Di vê derheqê de em sersaxiyê dibêjne we rêzdarî, û hemû malbata birêz ya Barzanî, û xwe beşdarî xema we dizanin.

Em hêviya temendirêjî û tendirustiyeke baş ji we û endamên malbata we re dixwazin.

PDKÎ
Lêpirsyarê giştî
Mistefa Hicrî

Şehîdbûn, mirineke birûmet

Digel rêbaza şehîdan peyman hate nûkirin

Kurdistanmedia: Rêûresma 10`ê Xakelêweyê roja "Şehîdên Kurdistanê" di sê beşên cuda de, li ser cimata şehîdan, vekirina pêşangeha wêneyên şehîdan û hola giştî ya merasimên hizbê bi rê ve çû.

Nûçegihanê malpera "Kurdistanmedia"yê rage-hand ku sibezûya îro Înê 10`ê Xakelêweyê roja Şehîdên Kurdistanê di binkeya serekî ya hizbê bi beşdariya rêzdar Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî yê hizbê û endamên Navenda Siyasî û Desteya Kargêrî û kadr û pêşmerge û mêhvanan û malbatên şehîdan bi rê ve çû.

Ew merasim di beşa yekem de bi rêjeya leşkerî ya Hêza Pêşmerge a Kurdistanê ber bi cimata şehîdan dest pê kir, û li ser cimata şehîdan du sirûd li jêr navên "Ey Şehîdîdan" û "Merêjin bom Firmêskî Xem" ji aliyê hêza pêşmerge ve hate xwendin.

Piştre Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ digel du malbatên şehîd xatû Şikûfe Mistefayî hevjîna şehîd Seyîdreza Dirûdger û Xûşke Ayişe Hemecanî diya şehîd Hêmin Molannijad tacegul a rêz û emegdariyê li ser tirba şehîd Seyîd Selam Ezîzî danîn.

Piştre pêşanangeha wêneyên şehîdan ji aliyê Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê PDKÎ û rêzdaran şikûfe Mistefayî û Ayişe Hemecanî ve bi rûyê beşdarên merasimê ve hate kirin.

Sêyem beşa vê merasimê bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û ragirtina deqeyekê bêdengî bona rêzgirtina ji riha pak ya hemû şehîdên riya rizgariya Kurdistanê dest pê kir.
Piştre peyama Komîsyona Civakî ya PDKÎ ji aliyê rêzdar Mamosta Ehmed Rehîmî berpirsê Komîsyona Civakî ya PDKÎ ve hate pêşkêşkirin.

Navbirî di peyama xwe de îşare bi rol û pêgeha Pêşewa Qazî Mihemed li ser tevgera Kurdistanê kir, û bas ji vê kir ku hemû jiyana Pêşewa hêjayî dersjêwergirtin û jêfêrbûnê ye.

Di beşeke peyama xwe de got: Em di derbazbûyî û heta niha jî li dijî zulm û zoriyê û çewsandinê di nava xebateke qurs û qahîm û bixwîn de bûn û hene, ku tê de bi dehan rêber û bi hezaran kadr û pêşmerge canê xwe pêşkêşî baregeha bilind ya azadiyê kirine.

Di beşeke din ya peyamê de jî hatibû: Di vê xebatê de ku herçend bê têçû (bedel) jî nabe, lê piştqahîm bi mîratê bicihmayî yê şehîdên xwe, û bi cangorîtî û lehengiya pêşmergeyên xwe û piştevaniya berdewam ya xelkê me, em xatircem in ku serdikevin û riha pak ya şehîdên xwe asûde dikin.

»»» R:4

www.arsivakurd.org

Sergotar

Sivikatî, alava helandinê

N: Kerîm Perwîzî

Di welatekê de ku çend kultur, netewe û ayînên cuda dijîn, hikûmeta desthilatdar tevî gef û derfetên cur bi cur berbirû ye. Li wan welatan de, bi sedema pir netewîtî, pir çandî û pêkhateya aloz ya civakê ve, jiyana civakî- siyasî û herweha îdarekirina hikûmet û parvekirina desthilat, saman û poanan li nav xelkê de, erkek aloz û pir metirsî ye û her pêngav û piratîkek ku nîşan ji cudahîdanan û bêparkirina hin kes û pêkhateyan bide, dibe sedemek ji bo herifîna baweriya xelkê li hember desthilat û hikûmetê.

Li civaka pir kultorî, netewî û olî ya Îranê de, her yek ji pêkhateyên sereke ên civakê xwe bi xwedî nasnameyek serbixwe û taybet dizanin û tu yek ji wan xwe bi beş yan paşkoya beşa din nizanin. Her çiqas ku çend dehsal in desthilata serdest li Tehranê de cehda helandin û nehiştina nasnameyên cuda dide û carek bi navê neteweya dîrokî ya xwedî şaristaniyeta kevnar ya Îranî! û carek din bi navê civaka yekdest ya îslamî ya Îranî! xwestine ku nasnameya civaka rengîn ya akinciyên Îranê yekdest nîşan bidin, lê ne Kurd xwe bi Fars dizanin û ne jî Ereb xwe bi şopînerên neteweyek din dizanin û ne jî, tu ol û ayînek din xwe bi paremayî û ayîna din bi pêşketî dizane.

Di civakek wusa û erdnîgariyek siyasî ya weha de, hikûmetek dadperwer a pêkhînerê wekheviyê di navbera neteweyan de ku hemû pêkhate bi awayek yeksan bihevre têde beşdar bin, dikare bi hemû aloziyan re bigihîje û gav bi gav girêhişkên dîrokî veke û di pirosesek demdirêj de, cehdê ji bo nehiştina şûnwarên tepeserî, sivikatî û bêpariya netewî û ayînî bide.

Lê di gotar û hizra desthilata Tehranê de ya ku heya niha cih negirtiye, bi yek çav dîtin û nihêrtinek wekhev e ji hemû neteweyan! Desthilata Tehranê çi bi navê îdeolojiya Wilayeta Feqîh û çi li jêr navê şaristaniyeta kevnare Îranî! hewl û xebat kiriye ku înkara cudahiyan bike û nasnameyek destçêkirî bi ser hemû erdnîgariya Îranê de ferz bike. Lê ji ber wê ku ev pênaseya destçêkirî rastîn nine û li nav hinavên civaka pirpêkhateyî ya Îranê de derneketiye, ji bo sepandinê hewcehî bi tepeserî û helandina nasnameya neteweyên ne Fars û ayînên derweyî Şîeya Wilayeta Feqîh hebûye û yek ji alavên tepeseriyê ku mifah jê standine, sivikatî bi nasnameya netewe û ayînên din bûye.
Bi dehan sal in ku pêvajoya han berdewam kiriye û bi sedan hezar çîrokên tejî sivikatî li jêr navê henek û qers li dijî neteweyên xeyrî Fars û ayînên cuda de çê kirine û bi sedan fîlm û pirogramên televîzyonî li her du serdemênPaşatî û Wilayeta Feqîh de weşandine, û mînaka herî davîn jî, li bernameya Newrozî ya îsal (1397) de ye li jêr navê "Paytexet"ku nerazîbûna neteweyên derweyî Farsan bi dûre hatiye.

Sivikatî bi nasnameyên din û bi sivik, paremayî û cihê şermezarzanîn û nîşandana wan, alava destê desthilata faşîstî ye ku dixwaze neteweyên derweyî Farsan û ayînên derweyî Şîeya Wilayeta Feqîh biçok de bîne, dagîr bike û paşan jî dûr bavêje. Lê ev metod ji siyaset û desthilatdariyê, ne tenê neteweyên zulmlêkirî û jêr stem yên Îranê biçokde nahîne, belkî tenê kerb û kîna zêdetir li nav civakê de diçîne û siberoj e ku bahoz jê berhem tê.

Beşdariya lêpirsyarê giştî yê PDKÎ di merasima sersaxiya "Dilovan Îdrîs Barzanî" de

Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ "Mistefa Hicrî" di merasima sersaxiyê ya "Dilovan Îdrîs Barzanî" birayê serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê de beşdarî kir.

Li gora nûçeya gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Sêşemî 14`ê Xakelêweyê, di yekem roja merasima xwedêjêrazî "Dilovan Îdrîs Barzanî", birayê "Nêçîrvan Barzanî" Serokwezîrê Hikûmeta Herêma Kurdistanê de, "Mistefa Hêcrî" lêpirsyarê giştî yê PDKÎ digel şandeke rêberatiya hizbê, di Pîrmamê de beşdarî kir, û bi vê boneyê jî hevxemî û sersaxiya PDKÎ ji "Mes`ûd Barzanî" û "Nêçîrvan Barzanî", û Partiya Demokrat re ragehand. Di vê merasimê de, şanda PDKÎ bi serokatiya "Mistefa Hicrî" ji aliyê "Mes`ûd Barzanî" û serkirdayetiya Partiya Demokrat ve, hate pêşwazîkirin, û şanda Partiya Demokrat tevî keyfxweşî nîşandana xwe ji bo beşdariya Mistefa Hicrî û şanda PDKÎ di vê merasimê de, şanda PDKÎ bi rêz û hurmet ve bi rê kirin.

Endam û alîgirên PDKÎ li Geliyê Qasimlo çalakiyên teblîxî lidar xistin

Endam û alîgirên PDKÎ di çend cihên Geliyê Qasimlo weke pişta tabloyên hatûçûnê, dîwarên baxçeyan û piran, siloganên şoreşgerane nivîsîn.

Ev silogan bi wî rengî bûn: "Qasimlo Qasimlo! riya te dom heye", "Silav li Pêşmerge", "Silav li Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê" û "Mirin ji bo rejîma Axûndî".

Her di vê derheqê de, di wan cihan de jî çalakiyên teblîxî hatine encamdan:
- Gundê Şiyan a girêdayî Jawaro a Sine
- Gundê Texte û Heşemîz bi boneya 10`ê Xakelêweyê.
- Gundê "Nê" a Merîwanê.
- Gundê Kanîberaz a girêdayî devera Şarwêrana Mehabadê.

www.arsivakurd.org

Peyama Komîsyona Civakî ya PDKÎ derheq roja Şehîdên Kurdistanê

Xelkê bişeref ê Kurdistanê
Malbatên serbilind ê şehîdan

Amadebûyiyên birêz ên rêûresma 10`ê Xakelêwe, roja şehîdên Kurdistanê!

71 salan berî niha û di rojeke wek îro de Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê Kurdistanê û Seyfê Qazî û Sedrê Qazî di qada Çarçira ya Mehabadê piştî derbazkirina heyamek girtîgehê û birêveçûna dadgeheke nimayişî, hatin bidarvekirin û tevlî karwanê şehîdan bûn. Lewra îro piştî 71 salan di vê rojê de em li vir li hev civiyane, da ku bi hev re bo careke din jî hem rêzê ji rojeke dîrokî di nava tevgera rizgarîxwaziya neteweya xwe de bigrin, ku roja mirina serbilindane ye, û hem jî soza berdewambûna li ser rê û rêbaza şehîdan dubare bikin, û qewl û sozê bidin wan, ku her bi vî awayî qurs û qahîm li ser armancên ku wan di pêxemê de canê xwe gorî kirin berdewam bin. Lewra bi nûneratiya ji aliyê rêberatiya PDKÎ ve , em silavan dişînin bo canê pak yê pêşewayê xwe ê mezin û tewahiya şehîdên riya rizgariya Kurd û Kurdistanê û serê rêz û hurmetê li hember malbatên wan ên serbilind de ditewînin.

Rêzdarno!

72 salan berî niha dema ku Komara Kurdistanê li ser destê PDKÎ û komeke mirovên şoreşger û neteweperwer ên Kurdistanê û li serveyî hemiyan jî Pêşewayê nemir hate avakirin, û yekem dewleta modern ya Kurdî di dîroka Kurdistanê de neqişand, û di heyama kêmtir ji salekê de yek ji ezmûnên herî biçirûsk ên Kurdistanê û heta navçeyê jî ser girt, û meznahiya koşka dîktatorî û deshilata hikûmeta navendî ji vê wêraniya ku hebû zêdetir xiste lerzînê. Eva bû kabûsa dagîrkeran, û di encamê de her çi ji dest wan hat xistin kar bona vê ku vê ezmûnê ji holê rakin… Lewar piştî 11 mehan ku bi ser avakirina Komara Kurdistanê re derbaz bibû, hêzeke dagîrker bi alîkariya komeke fakterên derveyî û navxweyî karî ku bi ser Kurdistanê de zal be, û bi bidarvekirina avakerên Komara kurdistanê û li serveyî hemiya Pêşewa û Sedrê Qazî û Seyfê Qazî di 10`ê Xakelêweya 1326`an de piştî dadgeheke nimayişî dawî bi temenê Komarê bîne, lê nezanîn ku armancên komarê û cangorîtiya rêberên wê, çi buhayeke mezin in, û çi bo nivşên pêşrojê vediguhêzin, û piştî 71 sal bi ser vê bûyerê re çîroka merge serbilindane yê Pêşewa niha jî xwediyê bilindtirîn dersa xelkhezî, û azadîxwazî û serfirazî ye, û evîneke bihêz e jî bo xistina qedeman ya hemû metirsî û nexweşiyan.

Hêjano!

Avakirina Komara Kurdistanê û cesûrî û berxwedaniya xortên avakerê Komarê û jiyana wan mirovên têkoşer çiqas hilgirê waneyên şoreşgerî û azadîxwaziyê bin, şehîdbûna wan jî du hemberî wê hilgirê wan wateyên bilid e, ku di serdema şehîdbûna Pêşewa heta niha jî hêza bibandor ya di nava dîroka azadîxwaziya neteweya me ye. Îro li vir bas ji jiyana şoreşgerane nîne, basê mirina şoreşgerane ye, ku bêguman bi heman radeya jiyana şoreşgerane, roleke bibandor di dîroka bizava rizgarîxwaziya neteweyan de bona bidestveanîna serwerî û rizgariyê hebûye. Pêşewayê nemir bi bexşîna canê xwe, waneyek fêrî me kir, ku tu zindîbûn û manek nikare bi qasî wê be. Waneya mirina di pêxema xelk û xak û welat de..! mirin di pêxema azadî û bi serbilindî jiyankirinê. Her ew waneya bû ku serbarê dijwariya riya xebat û berxwedana neteweya me, û hovîtiya dijminên me, lê takên vê neteweyê bi şewq û zewq ve, berê xwe didnê, û ji tu metirsiyekê nasilikin, û heta hekî bi dana canê wan be jî, eva ye sirra mirina şoreşgerane. Diyarîkirina vê rojê jî, wekî roja şehîdên Kurdistanê ji aliyê hizba me ve, beşeke herî girîng ya wê, vedigere ser van watayên bilind, ku di çîroka mergê Pêşewayê mezin de hene. Mirinek di pêxema nîştiman de. Mirinek di pêxema azadiyê de. Mirinek di pêxema xelkê, û di encam de mirinek di pêxema jiyanê de.

Rêzdarno!

Em di derbazbûyî de, û heta niha jî di xebateke qurs û qahîm û bixwîn de bûn û niha jî em hene. Li dijî zulm û zor û çewsandinê di vê xebatê de bi dehan rêbe rû sedan û hezaran kadr û pêşmerge û dehan hezar xelkê azadîxwazê neteweya me pêşkêşî baregeha bilind ya azadiyê kirine. Kesanek ji takên xwedîbehre ên xwedîşiyan ê vî welatî canê xwe pêşkêş kirine ku gellek bi xatircemî ve dikarim bêjim dihate kirin ku bingeha civakek azad û demokrat û pêşkevtî li ser danên. Lê felsefeya ku PDKÎ li ser hatiye danîn, perwerdeyek e ku ew hizba di nava derûna takên vê hizbê de cih kiriye. Wisa kiriye ku hemû jiyanê

Mela Ehmed Rehîmî berpirsê Komîsyona Civakî ya PDKÎ

Mixabin di rewta vê xebatê de, hejmarek ji baştirîn xortên hizb û gel, me pêşkêşî baregeha azadiyê kirin, lê hemase û cangorîtiyek ku wan nîşan dan, selmînerê vê rastiyê bûn, ku em hêşta jî li ser piyan in, û bo jiyaneke azad û pêşkevtî di hemberî tu metirsî û astengiyekê de, paşve venagerin.

û bi taybetî jiyana bindetsiyê bi her nirxekê wernegirin. Her di vir de ye ku çîroka canbexşîn û şehîdbûna di pêxema jiyaneke baştir û serbilindanetir hate holê.

Her vê yekê jî weha kiriye ku çîroka şehîdbûna vê neteweyê û xebata qurs û qahîm û bixwîn ya wan ne tenê nabe sedema şêwandina rûçikê xebata me, belku berevajî em bi şehîdên xwe serbilind in, û her li ber wan e jî ku xebata me xwediyê pirestîjeke bilind ya mirovî û exlaqî û siyasî ye, eva sirra felsefeya şehîdbûnê ye. Di rêrewa vê xebata bixwîn ya neteweya me, em najîn û namirin di pêxema mirinê de, em dimirin di pêxema jiyanê de.

Xelkê xwedîşeref ê Kurdistanê!

Di sê salên borî de hizba me bi hestkirina bi berpirsayetiya dîrokî li hemberî maf û azadiyên neteweya me, û di pêxema vegeşandina xebateke hemû alî, di bin navê "Rasan"ê, û li jêr diruşma pêkvegirêdana xebata çiya û bajar, qonaxeke nû ji xebat xwe li dijî rejîma kevneperest ya Komara Îslamî dest pê kiriye.

Mixabin di destpêka cîbicîkirina vê xebatê di qonaxa nû de gellek kes rabûn, û bi awayekî ji awayan dijberiya xwe li hemberî vê pêvajoyê nîşan dan, û ji dîtingeha kurt û asûdexwziya xwe û bêîradeyiya xwe ve, ji felsefeya Rasanê û îradeya vî gelî ji bo avakirina dîroka xwe tê negihîştibûn. Ewan nîşan dan ku ne ji dîroka aştîxwaziya vî gelî tê gihîştîne, û ne jî ji raz û sirra şehîdbûnê û bi

www.arsivakurd.org

şewq ve er bi pêşwazîçûna mergê Qazî û Qasimlo û Şerefkendî û bi hezaran şehîdên vî gelî tê gihîştibûn. Di destpêkirina qonaxa nû de, me haj ji metirsî û nirxa vê xebatê hebû. Me baş dizanî û dijminê me çiqas dirnde ye, û me baş jî dizanî û ku nirxa azadiyê çiqas giran e, û me baş dizanî gelek azadiyê bixwaze, dibe nirxa wê jî bide. Mixabin di rewta vê xebatê de, hejmarek ji baştirîn xortên hizb û gel, me pêşkêşî baregeha azadiyê kirin, lê hemase û cangorîtiyek ku wan nîşan dan, selmînerê vê rastiyê bûn, ku em hêşta jî ser piyan in, û bo jiyaneke azad û pêşkevtî ji tu metirsî û astengiyekê paşve venagerin, û hekî bi bexşîna canê xwe be jî, ew wekî rêber û hevçeperên xwe ên şehîd ew hizr û felsefeya anîn bîra me, ku mergek ku di pêxema nîştiman û riya azadiyê û bexteweriya mirovan be, gellek binirxtir e. Her eva jî remz û raza man û berdewamiya vê neteweyê ye.
Lewra bi hewce dizanim ku di vê rojê de carek din silavan bişînim bo riha pak ya şehîdên qonaxa nû ya xebata neteweya me şehîdên Rasanê.

Rêzdarno!

Îro navçeya me ji qonaxên herî hestiyar û pirr guherîn ên xwe re derbaz dibe. Gelleke civak guhertinên kûr tê de pêk hatine, ku herçend beşek ji van guherînkariyan, aramî tê de cih negirtiye, lê ew yek ji vê kêm nake ku koma van guhertinan tiştekê dibêje me, ku ew jî ew e ku serdema deshilatdariya reha (tewaw) ya dîktatoran bi ser diçe, û hertim li hemberî metirsiya berbirûbûnê ya xelkê xwe ne. Civaka me jî di bin deshilat axûndan de nikare ji vê taybetmendiyê bi dûr be. Bi baldan bi vê bêşiyaniya siyasî û civakî û kulturî û aborî ya ku di Îranê de heye, pêkhateya vê civakê lerzok kiriye. Lewra zêdetir ji her demekê egera vê guherînê tê de nêzîk e. Herçend di vê navberê de Îran dixwaze bi destêwerdan û vegeşandina çalakiyên xwe li derve wêneyeke bihêz ji xwe nîşan bide, lê hemû amaje bas ji vê dikin ku di warê navdewletî û navçeyî de Îran ber bi kontrolkirin û dûrragirtinê diçe, û ji vê zêdetir nikare bi afirandina kêşeyan li derve, kêmasiyên xwe dapoşe,lê anbe ew yek ji bîra me here ku her cure cih girtinek di vê guherînkariyê de, û desteberkirina mafên neteweya me girêdayî ye bi asta amadeyî û bandora me.

Ji dîtina xweamadekirin bo cihgirtineke bibandor di van guherînkariyan de, li destpêka Reşemeha sala borî de kongireya 16`an a PDKÎ bi rê ve çû, û komeke guherînkariyên girîng di pêkhateya hizbê de pêk anîn, ,ku her hemû jî di pêxema berfirehkirina sînorê çalakiyan, û bi xwe ve girtina zêdetirîn hêza mirovî ne di pêvajoya xebatê de. Em di rewşekê de ne ku pêwîste em zortirîn hêz û enirjiyê rêk bixin û ber bi aliyeke bibandor rênîşandan bikin. Kongireya 16`an gellek bi başî karî nexşeya berfirehkirina sînorê çalakî û komkirina hêz û enirjiyên bi bandor darêjin, ku em hêvîdar in di warê piraktîkê de jî bikarin bi awayê herî baş bi encam bigehînin.
PDKÎ sermayeyeke remzî û mirovî ya gellek mezin heye, û em xatircem in ku bi piştqahîmiya bi van remzên mezin ku di biyavê hizrî û neteweyî de me hene, wê hêza mirovî ku em xwediyê wê ne, emê serkevin.
Di vê xebatê de, ku herçend bi bê dana nirxan nabe, lê piştqahîm bi mîrata bi cih mayî ya şehîdên me, û bi cangorîtî û lehengiya pêşmergeyên xwe, û piştevaniya bêqisûr ya xelkê xwe, û bi bernameyeke pêşkevtî ku me heye, em xatir cem in ku emê serkevin û canê şehîdên xwe asûde bikin. Di dawiyê de, carek din em silavan dişînin bo canê pakê yê Pêşewayê şehîd, û hevalên wî, û hemû şehîdên Kurdistanê

Serkeve xebata rizgarîxwazane ya neteweya me bi rêbertiya PDKÎ

Komîsyona Civakî ya PDKÎ
10.01.1397

»»» Doma manşêtê

Di nava merasimê de herwisa sirûdek li jêr navê “Şehîd” ji aliyê koma muzîkê ya hizbê ve hate pêşkêşkirin.

Di vê merasimê de pexşanek li jêr navê “serdarekey serdar” ji aliyê hevalê pêşmerge Cemal Fethî (Koçer) ve hate xwendin.

Piştre sirûda Şehîd ji aliyê zarokên “Navenda Nêrgiz” ve hate pêşkêşkirin.
Di dawiya merasimê de beste û meqamek ji aliyê hunermendan Xulam Fatihî û Nizam Secadî ve hatin pêşkêşkirin.

Herwisa Ji bo rêzgirtin ji salroja “Şehîdên Kurdistanê”, rêûresmeke berfireh di Navenda 3 a Kurdistanê de hate lidarxistin.

Nûçegihanê malpera “Kurdistanmedia”yê, ragehandiye ku: Roja Şemî 11`ê Xakelêweya 1397`an, bi beşdariya kadr, pêşmerge û malbatên PDKÎ û mêhvanên vê rêûresmê, roja “Şehîdên Kurdistanê”, di Navenda 3 a Kurdistanê de, bilind hate ragiritin.

Ev rêûresm bi xwendina sirûda neteweyî a “Ey Reqîb” û ragirtina deqeyekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha pak a şehîdan û bitaybet şehîdên Rasanê dest pê kir.

Piştre “Kerîm Qelatî” endamê Navenda 3 a Kurdistanê, bi boneya roja “Şehîdên Kurdistan”ê, peyamek pêşkêşî kesên ku di vê rêûresmê de beşdar bibûn kir.

Navbirî di beşeke peyama xwe de bas ji vê kir ku: Îsal em di heyamekê de roja 10`ê Xakelêweyê, ya bîranîna şehîdên nemir yên xwe bilind radigirin ku, xebata nû a Rasana Rojhilat a Kurdistanê de, çendîn qehreman pêşkêşî baregeha azadiyê kiriye, û xwîna sor ya wan bûye hêvinê rêbaza me di xebatê de.

Peyama saziyên Yekîtiyên Ciwanan, û Jinan ên PDKÎ ji aliyê “Amîne Îqtîdad” ve hate xwendin.

Piştre sirûda bi navê “Werin ba biçîne ser gorî şehîdan” ji aliyê “Siyamend Şabûyî”, pêşmergê PDKÎ ve pêşkêşî amadebûyiyan hate kirin.

Di beşeke din a vê rêûresmê de, sirûdeke din a bi navê “Megrî Megrî” ji aliyê “Zozan û Şefeq”ê ve hate pêşkêşkirin.

Piştre sirûda “Ey Şehîdan” ji aliyê dersxwenên kempa Cêjnîkanê ve hate pêşkêşkirin.

Her di vê derheqê de di piraniya welatên Ewropî jî endam û alîgirên PDKÎ bi pêkanîna merasiman û çalakiyan rêz ji vê rojê girtin.
Di navxwe ya welat de jî endam û alîgirên PDKÎ serbarê zextên rejîma Îranê, û serbarê rewşa tund ya ewlehiyê bi her awayekî ku ji destê wan hat, kar û çalakiyên teblîxî taybet bi roja Şehîdên Kurdistanê bi rê ve birin.

www.arsivakurd.org

Kurd goriyê netifaqiyên navxweyî

www.arsivakurd.org

Dara Natiq

Doza berheq a Kurd di van çend salên borî de, ji hemû demekê zêdetir di rojevê de bûye, û bizava Kurdî dikarî bizanebûn û hişyariyeke zêdetir, vê derfeta han ji bo pêşvebirina berjewendiyên xwe yên neteweyî bi kar bîne. Lê mixabin derswernegirtin ji ezmûnên tall yên berê û netifaqî û ji hev dûrketina roj bi rojê zêdetir a partiyên siyasî yên Kurdan, cardin valahiyek di nava bizava Kurdî de çê kirin, ku dujmin û dagîrkerên Kurdistanê weke derfetek ji bo betalkirina xewn û hêviyên mafxwazane yên neteweya Kurd mifahê jê werbigrin.

Bûyerên karesatbar yên sala 2017-2018`an vê yekê baş didin xuyakirin, ku tevgera Kurdî hevrîşî parvebûn û lêktirazaneke berçav bûye.

Tu carî bi qasî dema pêş rêfrandomê û niha Kurd tûşî perçebûn û ji hev belavbûnê nebûne. Di zirûfa niha de, ger bizava Kurdî bi giştî di herçar parçeyên Kurdstanê de pêdeçûnek bi ser mêtoda xebet û stratêjiyên xwe de nekin, û tekezê li ser hevduqebûlkirin û hevgirtin û berjewendiyên xwe yên neteweyî neke, yê tûşî hiloşîn û xesareke mezintir ji niha bibe. Veşartina rastiyan, û senger li hevdu girtin, û dijberî û bûn bi ecêndaya dagîrkeran bona şikandina hevdu, wê karesatên mezintir ji xeyaneta 16`ê octeberê û bûyerên karesatbar ên Şengal û Efrînê û...hwd, bi xwe re bîne. Ya ku niha dixuye, tevgera Kurd bi du eniyên cuda û têfikirînên ji hev dûr dixebitin. Eniyek ku hilgirê hizrek serbixweyîxwaz û nasiyonalîst e, û serbarê tev zext û givaşên heyî ji bo gihîştin bi xewna serbixweyî a gelê Kurd fîdakariyê dike, û tehemula zehmetî û astengiyan dike. Lê eniyeke din bi tewahî dij bi hizra serbixweyîxwaziyê sekiniye, û bûye ecêndeya dagîrkeran û çavê wan li hember berjewendiyên neteweyî Kor e.

Kultura milmilanê û kerb û kîn û senger lihevdugirtina bizava Kurd û bi taybetî eniya girêdayî dagîrkeran ve, tu xatircemiyek ji bo ewlehiya neteweyî û pêşdebirina doza berheq a neteweya Kurd nehêlaye. Bi wê netifaqiya ku îro di nava mala Kurd de heyî, Kurd nikare zemaneta manewa xwe heta bo yek rojê jî bike, ca çi bigihîje bo demek dirêjtir. Metirsiya çêbûna şerê birakujî di nava bizava Kurdî de, ji hemî demek zêdetir di rojevê de ye. Hêzên dagîrker û yek ji wan Komara Îslamî a Îranê bi mifahwergirtin ji wê valahiya ku di nava bizava Kurdî de çêbûyî, kariye hêjmoniya xwe bisepîne û ji rêya aliyên girêdayî xwe ve, astengiyên mezin li hember hizra nasyonalîst û serbixweyîxwazî a gelê Kurd de çê bike, û valahiya han ji bo netifaqiyên zêdetir heya asta çêkirina şerê birakujî weke derfet bi kar bîne.

Di vê zirûfa han a hesas de ku dagîrkerên Kurdistanê serbarê asimîle û qirkirina Kurdan û çêkirina netifaqî û şerê birakujî, li hewla parçeparçekirin û guherîna demografiya Kurdistanê de ne, lewma pêdivî ye ku bizava Kurdî li hember wan pîlan û metirsiyên han bi zanebûn û hişyarî û berpirsane bilivlive, û berjewendiyên neteweyî nekin qurbaniyê nakokî û

> Tu carî bi qasî dema pêş referandomê û niha, Kurd tûşî perçebûn û ji hev belavbûnê nebûne

kerb û kîna li hember hevdu de. Çaresernekirina vîros û xwexuriya di nava bizava Kurdî û veşartina îxanetên pişt perde a wan kes û girûpên girêdayî dagîrkeran, wê malwêraniyeke zêdetir ji bo Kurdan bi xwe re bîne, û rêya gehîştin bi elenda serkevtinê dirêjtir bike.

Dibe berjewendiyên neteweyî û nîştimanî weke bingeha sereke a hizr û stratêjiya siyaseta Kurdî were bikaranîn, û gelê Kurd ji hizb û girûpan derbas bibe û neteweyî biryar bide, hekî ne, qederek biyûm û nediyar li benda me ye.

Xebata Kurd bo bidestveanîna azadî û mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe her berdewam e

Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê bi boneya 10`ê Xakelêweyê roja şehîdên Kurdistanê daxuyaniyek belav kir.

Deqa peyamê weha ye:

Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!

10`ê Xakelêweyê roja bidarvekirina Pêşewa Qazî Mihemed serkomarê Kurdistanê û Sedrê Qazî û Mihemed Husênxanê Seyfê Qazî ye. 71 salan berî niha di roja 10`ê Xakelêweya 1326`an de, Pêşewa Qazî Mihemed yekem serkomarê dewleta Komara Kurdistanê di Çarçiraya bajarê Mehabadê de, rast di wî cihî de ku Pêşewa Qazî, Komara Kurdistanê ragehandibû, bi fermana Mihemed Rizaşahê Pehlewî hate bidarvekirin, û canê xwe yê pak di riya azadiya gel û nîştimana xwe gorî kir. Çend rojan piştre jî hejmareke din ji efserên Spaha Millî ya Kurdistanê û karbidestên din ên hikûmeta Komara Kurdistanê di navçeyên Seqiz û Bokanê de hatin bidarvekirin.

Bi vî awayî rejîma Mihemd Riza Şah piştî vê ku di encama gelekomeyeke navneteweyî de karîbû Komara Kurdistanê ji nav bibe, bi armanca serkutkirina tevgera mafxwazane ya xelkê Kurdistanê pêleke berfireh ya îdam û kuştin û girtin û şopandin û zext û givaşê di Kurdistanê de dest pê kir. Karbidestên dewleta Tehranê ser vê baweriyê bûn, ku bi vî karî dikarin bîra azadîxwaziyê di nava xelkê Kurdistanê de bo hertim ji nav bibin, lê herwekî Pêşewa di dema bidarvekirinê de rû li kirêgirtiyan ragehand: "Bi kuştina min bîra azadîxwaziyê di Kurdistanê de, ne tenê ji nav naçe, belku di pêşerojê de bihêztir jî dibe". Bûyerên piştre rewayiya vê gotina hekîmane ya Pêşewa selimandin, ku gelê Kurd ne tenê her dest ji xebat û berxwedan û armancên Komara Kurdistanê hilnegirt, belku armancên Komara Kurdistanê bûne sembol û mînaka xebat ji bo azadî û rizgariya neteweya Kurd di raserî navçeyê de, heta ew hemû zext û serkutkirina ku Komara Îslamî wekî mîratgirê biheq ê rejîma paşatiyê, di heyama deshilatdariya reş a xwe de li dijî gelê Kurd bi kar aniye, bi xebata yekgirtî ya siyasî û medenî ya xelkê Kurdistanê bersiveke tund pê hatiye dan. Waye ku îrorojê di her çar perçeyên Kurdistanê de xebta bo rizgariyê bi awayên curbicur dom heye.

Lewra roja 10`ê Xakelêweyê di dîroka xebata rizgarîxwazane ya xelkê Kurdistanê de, hekî ji aliyekî ve wek rojeke tall û nexweş tê naskirin, lê ji aliyekî din ve wekî roja peyman nûkirinê û nîşandana yekgirtinê bona gihîştina bi armnacên tevgera neteweyî-demokratîk a xelkê Kurdistanê tê naskirin. Niha piştî derbazbûna heft dehikan bi ser bidarvekirina Pêşewa û hevalên wî re, em dibînin ku tevgera Kurd bûye faktereke bihêz ya xebat û tekoşîna ji bo azadî û demokrasiya di Îran û navçeyê de, û bîra neteweyî û azadîxwazane di sertaserê Kurdistanê de, bi şêweya herî baş û bilind xwe nîşan da.Îrorojê civaka Kurdistanê hatiye guhertin, û bûye civakek çendreng û pêşkevtî û peloral û çend hizbî. Lê hemû hizb û rêkxirawên nîştimanî û demokratîk û azadîxwaz ên Kurdistanê, serbarê cudahiya siyasî ya di navbera wan de rêz ji Komara Kurdistanê û armancên wê digrin. Ew yek nîşanderê vê ye ku Pêşewa û armancên Komara Kurdistanê, ne tenê her milkê hizbeke diyarîkirî nine, belku nîşana hevbeş ya kultura siyasî ya azadîxwazane ya xelkê Kurdistanê û hizbên xebatkar ên ser qada xebata di Kurdistanê de ne. Pêşewa Qazî çi di dema ragehandina Komara Kurdistanê de, û çi jî di wesiyetnameya xwe de, wekî rêberekî neteweyî û dilsoj û şareza pê li ser vê yekê dadigre, ku xebatkarên gelê Kurd hewce ye di hemberî dijminên Kurdistanê de qahîm û yekgirtî û hevdeng bin, û di nav xwe de jî û di hemberî yektir jî nerm û dûrbîn û singfireh û bisebir bin.

Lewra em ew hizb û rêkxirawên ku di çarçoveya Navenda Hevkariya hizbên Kurdistana Îranê kar dikin, li dewra hevûdin kom bûne, û îsal di salvegera 10`ê Xakelêweyê de serbarê hemû cudahiyên hizbî û siyasî ên xwe, bo carek din jî di pêxema berbipêşvebirina armancên xelkê Kurdistanê de, pêkve pê li ser hevkarî û hevdengî û hevxebatiya digel yektir dadigrin. Peymanê jî digel riha pak ya Pêşewa û hemû şehîdên riya azadî û rizgariya xelkê Kurdistanê nû dikin, ku alaya xebata wan heya serkevtinê bilind û bipêl radigrin.Em vê derfetê bi kar tînin û daxwazê ji xelkê Kurdistanê dikin, ku hindî zêdetir li dewra armancên tevgera Kurdistanê kom bibin, û xwe organîze bikin, û refên tekoşînê û çeperên berxwedaniyê bihêztir bikin, ew morala xebatkarane ya we ku di boneyên curbicur ên îsal de, wekî rûdawa erdheja Kirmaşanê û piştevaniya ji kolberan û bibîranîna newrozê, we ji xwe nîşan da, bo me jî wekî hizb û rêkxirawên siyasî bûye hêvinê yekîtî û hevxebatiya zêdetir, û ji bo derswergirtinê dibe. Em bi hêviyeke zor û moraleke bilind ya xebatkarane ve ber bi saleke din ji xebat û berxwedanê ve diçin.

Ji vir ve jî bi ew qasê berpirsyariyê ve em radigehînin ku gelê Kurd di Kurdistana Îranê, û hizb û rêkxirawên xebatkar amadeyî û şiyan û derfeta vê yekê di xwe de dibînin, ku di pêvajoya guherînên Îran û navçeyê de, wekî paramêtreke mezin û bibandor û demokrat rola xwe bilîzin, û ezmûna siyasî ya Komara Kurdistanê û tevgera nû ya van çar dehikên borî ên Rojhilata Kurdistanê ber bi pêşve bibin.

Silav li riha pak ya Pêşewa Qazî û hemû şehîdên riya azadî û rizgariyê!
Silav li armancên komara Kurdistanê!
Silav li xelkê xebatkar ê Kurdistanê!

Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê
08.01.1397

www.arsivekurd.org

Nerîna Lîderan

Mihemed bin Selman:

“Hem Îsraîlî û hem jî Felestîniyan mafê jiyana aştîxwazane li ser erdên xwe hene”.

Erdoxan:

“Aha belengazan wê Netanyaho bigre”.

Netanyaho di bersiva Erdoxan de:

“Arteşa Îsraîlê naxwaze ku dersa exlaqê ji kesî fêr be ku bi xwe bi salan e sivîlan komkuj dike”.



James Mattis di dema pêşwaziya ji John R. Bolton:
“Spas ku tu hatî. Min bihîst ku tu wekî şeytan î. Ez çavnihêrê dîtina te bûm”.

Li Parîsê rewşa Kurdan di panêleke siyasî de hate nirxanidin

Di panêlekê de ku li ser rewşa Kurd, bi hewla Kendal Nezan serokê Enstîtuya Kurd li Parîs pêk hatibû, Îdrîs Ehmedî endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ ragehand ku serbarê hemû serkutkariyan di Rojhilata kurdistanê, xebateke medenî heye û pêşmerge jî piştevanê xelkê Kurdistanê ne.

Di vê panêla siyasî de, Îdrîs Ehmedî bi eşker bas ji destêwerdanên rejîma Îranê di nava karûbarên welatên navçeyê û bi taybetî dariştina pîlana dagîrkirina Kerkûkê kir, û ragehand ku li her cihekî ku Kurd bixwaze deskevtekê bi dest bixe, rejîma Îranê berî hemiyan dijayetiyê dike.

Wî herwisa got ku rejîma Îranê radigehîne ku Îsraîl û Erebistan û Amerîka piştgiriya tevgera kurdî dikin, û armanca rejîmê ji vê yekê, ew e ku tevgerên nîştiman lawaz bike, niha aliyên Kurdî dest bi xebateke nû bi navê Rasan kiriye ku ew jî tê wateya berdewamiya xebatê. Ew jî di demekê de ye ku givaş li ser hêzên Kurdî heye.

Komara Îslamî givaşa xwe li ser partiyên siyasî û li ser xelkê zêde kiriye.Rejîma Îranê ku berê du serkirdeyên Kurd bi navên Dr. Qasimlo û Dr. Şerekendî teror kirine niha jî berdewam e li ser van teroran.
Niha li Kurdistana Îranê berxwedaneke sivîl heye, û rejîm dixwaze ku hêza çekdar bi kar bîne, bo serkutkirina vê xebata medenî, lê hebûna hêza çekdar dibe piştevanek bo vê hêza medenî.

Herwisa di vê panêlê de Osman Baydemir parlemantarê HDP`ê û siyasetvanê naskirî ê Bakûra Kurdistanê ragehand ku êrîşa bo ser Efrînê dagîrkirina xaka Kurdistanê ye, û Erdoxan piştî têkçûna DAÎŞ`ê dixwaze ku li hemû herêmê de deshilatdariyekê bo wan cehadîst û tundrevên Îslamî ava bike ku ser bi Tirkiyê ne, û hekî civaka cîhanî pêşiyê ji wan tundreviyên Erdoxan negre, ew deshilatdariya tundrevan, wê pêk bê.

Wî herwisa ragehand ku Tirkiye li hemû cihekî dijî mafê Kurdan e. Li Başûra Kurdistanê jî me dît ku çawa dijberiya referandomê kir, û piştgiriya dagîrkirina Kerkûkê kir. Wî got hekî Kerkûk neketiba, Efrîn jî nediket.
Wî derheq hevpeymaniya AKP`ê ya bi MHP`ê re got: Erdoxan dostatiya MHP`ê kir ku bikare bi piştevaniya wan li ser kursiyê deshilatê bimîne, û şertê MHP`ê jî ew bû, ku li her ciekî Kurd hebin, dibe Erdoxan dijayetiya deskevtên wan bike, û her du aliyan li ser vê yekê rêkkevtin kir.

Serkomarê Tirkiyê berdewam e li ser gefên xwe

Erdoxan serkomarê Tirkiyê ku bi alîkariya çeteyên bi nav Arteşa Azad û bi van hemû teknolojiya xwe ya pêşkevtî du heyvan kêşa heya ku karî têkeve Efrînê, niha jî gefa çûna bo nav Şengalê dixwe.

Navbirî roja borî ragehand ku wan dest bi operasiyona li Şengalê kiriye, lê Îraqê ret kir ku hêzên wan ketibin nav Şengalê de. Navenda Hevbeş ya Îraqê bi weşandina daxuyaniyekê belav kir ku rewş di herêmên Mûsil, Şengalê û navçeyên sînorî aram e, û tu hêcetek nine ku hêzên Tirkiyê têkevin nav sînorên wan de.

Ji aliyekî din ve di demekê de, Tirkiye berdewam e li ser gefan li dijî Şengalê, ku KCK`ê bi weşandina daxuyaniyekê ragehand ku erk û wezîfeya wan ya li Şengalê bi dawî hat, û ewê vegerin cihên xwe yên berê, û ew naxwazin ku şerekî din di Şengalê de rû bide, ku cardin û bi fermaneke din Êzidî ji warê xwe aware û derbider bin.
Herwisa KCK`ê ragehand ku wan di dema êrîşa DAÎŞ`ê bergirî ji Êzidiyan kir û piştre jî hekî ew ratsî êrîşan bên, emê bêne Şengalê û bergiriyê ji wan bikin.

Ew hemû êrîş û gefxwarinên berdewam ên serkomarê Tirkiyê herçend nebûne sedema vê ku civaka cîhanî pêngaveke bikiryar li dijî Tirkiyê hilgire, lê di asta bîr û raya giştî û bîr û raya civaka cîhanî de, ew baweriya çêbûye ku Erdoxan di hizra berfirehkirina bazineya deshilata xwe, û vegerandina Tirkiyê bo sînorên serdemê xelafeta Osmanî de ye.

Heta di vê derheqê de “John R. Bolton” şêvirmendê ewlehiya neteweyî ya Amerîkayê bi eşkere ragehandiye ku AKP Tirkiyê ji sîstema sekolar ve, ber bi sîstema xelafetê ve dibe, û dibe pêşiya wan zêderewiyên AKP bêne girtin.

Her derheq gefên Erdoxan bo ser Şengal û Qendîlê, siyasetvanê naskirî ê Bakûra Kurdistanê Osman Ocelan jî ragehand ku bêguman Erdoxan di fikra pêkanîna xelafeta Osmnaî de ye, û wê êrîşî ser Qendîlê jî bike, lê Amerîka û hevpeymanên wê bona vê ku, hez nakin şer zû bi dawî bê, wê sîstema paratsina esmanî danên, da ku Tirkiye nekare balafirên şer bi kar bîne, lewra hevsengiya şer heya astekê wê bê parastin, û şer wê gellek dom bike, û ew yek di berjewendiya Amerîkayê û hevalbendên wê de ye.

Li gora gotina navbirî, eva tevlik û davek e ku Amerîkayê bo Tirkiyê daniye, da ku Tirkiyê rastî lawazî û şikestê di şer de bike, û bîr û raya navxw eya Tirkiyê jî, li dijî Erdoxan tûj bike.

www.arsivakurd.org

Di 10`ê Xakelêweyê de şehîd “Kako” hate bibîranî

Rêvîngên riya pirr ji serwerî ya şehîdan di 71.mîn salvegera şehîdkirina Pêşewa de, şehîd Kako dersxwanê emegdar ê mekteba Pêşewa bi bîr anîn.

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê endam û alîgirên PDKÎ û rêvîngên rê û şopa şehîdan, wekî emegnasiyekê li hemberî şehîdê serkirde Kawe Cewanmerd serdana tirba bavê wî li bajarê sine de kirin, û bi danîna wêneyê şehîd Kawe û xemilandina tirba şehîd Necmedîn Cewanmerd bi camane û alaya Kurdistanê û qevdên gulan, hem emegdariya xwe bi rêbaza şehîdan nîşan dan, û hem jî peyman digel rêbaza pirr serwerî ya wî nû kirin.

Şehîd Davûd Cewanmerd naskirî bi Kawe Cewanmerd kurê şehîd Necmedîn Cewanmerd sala 1380`î a Rojî ji riya hevalên beşa rêkxistina nepenî ya nav bajarê Sine ve pêwendiyeke rasterast digel PDKÎ digre, û sala 1388`an a Rojî bi sedema eşkerebûna çalakiyên xwe, xwe gehande refa pêşmergeyên PDKÎ û piştî beşdariya di dewereya 193 a destpêkî a pêşmerge de, di buhara sala 1389`an de, bi awayekî fermî kincê pîroz û pirr ji şanazî ê pêşmergatiyê li xwe kir.

Bi sedema kêrhatîbûnê, di kongireya 15`an de wekî endamê Komîteya Navendî hate hilbijartin. Piştre erka berpirsayetiya TISH TV pê hate spartin û di vî warî de bêravestiyan kar û xebat kir.
Di sala 1394`an de, berpirsayetiya teşkîlata eşkere ya PDKÎ pê hate spartin, û di vê erk û wezîfeyê de jî bi dil û can xizmet kir.Mixabin roja 15`ê pûşpera 1395`an di gundê Boriyerê de, digel hevçeperê xwe şehîd Serkewt Semedî tevlî karwanê sorxelat ê hizb û gel bûn.

Pêşwaziya Makron ji Kurdên Rojava, Tirkiye êşand

Piştî vê ku Makron serkomarê Fransayê pêşwazî ji heyeteke siyasetvanên naskirî û bibandor ên Rojavaya Kurdistanê kir, Tirkiyê bi tundî dijkiryar ji xwe nîşan da, û Fransa wekî durû bi nav kir.

Roja borî Erdoxan derheq biryara Fransayê ya derbarê navbeynkariyê di navbera PYD`ê û Tirkiyê de got: “Gelo serkomarê Firansayê xwe çi dihesibîne ku dibêje emê navbeynkariyê di navberta Tirkiyê û -bi gotina wî- terorîstan de bikin”.

Piştre serkomarê Tirkiyê gef xwarin ku ewê herin Minbic, Girê Spî, Serê Kaniyê, Hesekê û Şengalê.
Her di vê derheqê de, Firansa ku di demên herî hestiyar de pişta gelê Kurd girtiye, dîsan ragehandiye ku ew nahêlin Tirkiye êrîşî ser Minbicê bike.

Heyeta ku serdana koşka Êlîze kiribûn jî, ragehandine ku hevdîtineke pirr baş bû, û Firansa amade ye ku hêzê bişîne Minbicê.

Serbarê vê ku Tirkiye radigehîne ku şerê wan tenê li dijî PKK û aliyên girêdayî PKK ye, lê çavdêrên siyasî radigehînin her çawa ku Tirkiyê gellek caran neveşartiye ku ew li dijî pêkhatina statuyeke Kurdî ne, vê varê jî ew êrîş her di vê çarçoveyê de ne, û ew naxwaze ku statuyeke Kurdî hebe, bi taybetî niha ku gellek nemabû Kurdên Rojava bigihîjin behra Medîteranê.

Herwisa Tirkiye di hizra vegerandina sînorên xwe bo serdema împeratoriya Osmanî de ye. Hêjayî basê ye ku şeva borî di bernameya civak û siyaset ya TRT6 de, mêhvanekî Kurd yê vê pirogramê ku şêvirmendê serokwezîrê Tirkiyê ye jî, bi eşkere got ku mafê Tirkiyê ye ku li gora madeya 51 ya yasaya şer, ji Efrînê dernekev. Herwisa bas ji vê jî kir ku Tirkiye hêdî-hêdî herêmên ku piştî hiloşîna împeratoriya Osmanî ji dest dabûn bi dest dixe, û tu aliyek nikare pêşiya Tirkiyê bigre.

Çalakiyên teblîxî yên bi boneya 10`ê Xakelêweyê dom hene

Endam û alîgirên PDKÎ bi boneya 10`ê Xakelêweyê roja “Şehîdên Kurdistanê”, bi awayekê berdewam û bi rengên curbicur pêyman digel şehîdên Kurdistanê nû dikin.

Li gora nûçeya gihîştî malpera “Kurdistanmedia”yê, bi boneya 10`ê Xakelêweyê, endam û alîgirên PDKÎ yên di bajarê “Nexedê” de, li ser bilindahiya “Qozlû” a gundê “Yonisliyan” a wî bajarî de, bi hildana alaya Kurdistanê, bi dirêjahiya 8 metran û panahiya 3 metran ev dever neqişandin.
Piştî hildana wê alaya Kurdistanê, caş û kirêgirtiyên rejîmê, ku çavên wan ba nedigirt, vê alaya hatî neqişandin a Kurdistanê bibînin, sibêzûyekê zû êrîşî ser çiyayê Qozlûyan kirin, û ev ala kom kirin.
Têkoşerên Demokrat di bajarê Kamyaranê de jî, alaya Kurdistanê bi boneya 10`ê Xakelêweyê hildan.

www.arsivakurd.info

Hikûmet sebeba birrîna nanê xelkê ye

Di civîna fermandar û berpirsên ewlehiyê yên rejîmê de, li bajarê Seqizê ya digel bazariyên wî bajarî de, xelkê dijkiryar li hemberî axavtinên berpirsên rejîmê de ji xwe nîşan dan.

Li gora nûçeya gihîştî malpera "Kurdistanmedia"yê, berpirsên ewlehî, îdarî û nûnerê dewletê di bajarê Seqzê de, bi çavsaxiya çend kesên girêdayî rejîmê civînek ji bo bazariyan û kasbikarên wî bajarî di pasaja "Elmasa Xerb" de lidar xistin.
Di vê civînê de, tevî pîrozbahîkirina sala nû, nûnerên rejîmê hewldan dan ku tawana rewşa nebaş a niha ya jiyanê û derbazkirina xelkê, ji stûyê xwe derbixin, û bixne stûyê neyarên "ferzî" de.
Li gora vê nûçeyê, hevwelatiyên bajarê Seqizê, bi awayekî eşkere ji fermandar û şanda dewletê re gotin ku: Em dizanin hûn tu karekî ji bo me encam nadin, û daxistina sînoran bi dirêjkirina enfal û qirkirinekê dizanin ku, di Kerkûk û Efrînê de bi awayekê eşkere dest pê kiriye, û di Rojhilat de jî ew siyaset bi daxistina riya kasibiyê û qutkirina nanê sivka (sifreya) yek bi yek ji gelê Kurd di vê parça Kurdistanê de tê domandin.
Nûçegihanê "Kurdistanmedia"yê, di vê derheqê de radigehîne ku:
Berpirsên dewletê xeryî soz û qewlên bê bingeh tu bersivek ji bo daxwaz û rexneyên xelkê tunebûn, û bi awayê giştî axavtinên wan ji kesên guhdar re ev yeka diselimandin ku tu tiştek baş nabe, belku ya heyî jî wê xirabtir be. Her di vê demê de jî, di Kurdistana Rojhilat de kirîza aborî bi sebeba daxistina bazarên sînorî gellek zêde bûye, û kasbikar û kesên bazarî, tevî xelkên asayî rastî bêkarî(betalî) û giraniya bazarê hatine.

"Kurdpa"yê amarên derheq rewşa mafê Mirovan ya Kurdistana Îranê di sala 1396`an de belav kir

Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, di raporeke amarî de, bas ji rêje û çavaniya binpêkirina mafê mirovan li Kurdistana Îranê, di sala 1396`an de kiriye.

Ev rapora li gora amarên ku hatine tomarkirin ji aliyê Navenda Amarê ya Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê ve, hatiye amadekirin, û bi awayê navgînî (rêjeyî) ye.
Navenda amarê ya Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê belav kiriye ku, 3 hezar û 166 caran binpêkirina mafê mirovan di Kudistana Îranê de çê bûne, ku ew yek li çav 5 salên derbazbûyî zêde kiriye, eva di demekê de ye ku ev amarane bibelge ne, û ji çavkaniyên bihêz û bawer pêkirî ve hatine wergirtin.
Li gora vê raporê di sala derbazbûyî de, 2191 mînakên giritin, kuştin û birîndarkirina kolberan di kurdistanê de me hebûne, herwisa 50 hevwelatiyên sivîl, girûpên dîlanê, 49 xwendekar, 14 çalakvanên medenî, 3 nivîskar, 3 mamoste, 3 çalakvanên Xwazayê, 3 helbestvan, 5 nûçegihan, 8 çalakvanên torên civakî, 2 mamostayên zanîngehê û komek ji hûnermend û kêmaniyên mesebî ji bo îdareya îtila`atê hatine gazîkirin.
Di sala 1396`an de 81 hevwelatiyên Kurd bi tometên siyasî- ewlehiyê ji aliyê dadgeha Înqilab a rejîmê ve ji bi hepsên demdirêj û nerewa hatine mehkûmkirin.Navenda Amarê ya Ajansa "Kurdpa"yê, bas ji vê kiriye ku di heyama yek sala derbazbûyî de, di Kurdistanê de mînakên binpêkirina mafê mirovan di Kurdistanê de zêdeyî vê ye ku bas jê tê kirin, lê mixabin bi sedema nebûna saziyekê taybet û destpêranegihîştina bi çavkaniyan, zanyariyên zêde di ber dest de tunînin.Deqa tewaw a vê amarê di beşa Farsî a Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê de heye, û ji bo mifahwergirtina ji vê amarê bi anîna navê çavkaniyê rê pê tê dan.

Teberzedî: Rejîm tirîbonên cihên muqedes bo derevan bi kar tîne

Hişmetullah Teberzedî ragehand, me Îraniyan di destên girûpeke qewmî de gîr kiriye ku bi derev dibêjin azadî di Îranê de heye.

Hişmetullah Teberzedî sekreterê giştî ê "Cibheya Demokratîk ya Îranê" di bersiva peyama newrozî ya Trump serkomarê Amerîkayê de ragehand, me Îraniyan di destên girûpeke qewmî de gîr kiriye ku bi navê meseb û ji tirîbonên cihên muqedes ve rojane derevan dikin, û dibêjin azadî di Îranê de heye. Navbirî di nameya xwe de nivîsandiye:

Ez jî bîr nakim ku Obama di peyamên xwe yên newrozî de xelk û rayedarên rejîm li rex hev didanîn, ku eva zulmeke eşkere bû derheq xelkê Îranê, rast wekî danîna gur û pez li cem hev. Lewra peyamên pîrozbahiyê ên Obama ji me re dilêş û bikovan bûn, heta ku cihê kêfxweşiyê bin.
Teberzedî di doma nameya xwe de bo Trump dinivîse:
Di dema îmzakirina Bercamê de min ji girtîgehê ve name jê re nivîsand, û ew name bi berfirehî di ragehandinên Amerîkayê de deng veda, û min hişdarî dabû Obama ku nabe xelkê Îranê û mafê mirovan bike qurbaniyê berjewendiyên axûndên hakim bi ser Îranê de, lê Obama guh neda vê daxwaza me.

Ez bi xwe zêdetir ji18 salan e ku bi sedema dijayetiya Xamineyî û rejîma wî girtî me, lê ez xebata xwe li dijî vê rejîmê didomînim.

Derheq guherîna rejîmê jî navbirî daxwaz kiriye ku ew wekî cîhana azad piştgiriya daxwazên yasyaî û demokratîk ên xelkê Îranê bikin, da ku xelk bikare di referandomeke azad û demokratîk de beşdar be. Bêguman %90 a xelkê Îranê wê dengê "NA" bidin vê rejîmê.

Di dawiyê de Teberzedî bo Trump dinivîse:

Xelkê Îranê azad nînin da ku bikarin spasiya we bikin, lê ez we xatircem dikim heta xebatkarên wekî min hebin, hekî di reşçalên rejîmê de bibin qurbanî jî, emê vê yekê bêjin ku, di pêşerojê de baştirîn dost û hevlabned bona aştî û pêkvejiyanê di herêm û cîhanê de, wê xelkê mezin ê Amerîkayê be

www.civakurd.org

Wêneyên Merasima roja Şehîdên Kurdistanê-Navenda 3

Zimanê Kurdî

Qursên Kurdî, A. Karabax

Mînak 520 : Ji bo wan çend bikaranîn :

1. Di awayê rewşîn de :

a. Gulçîn, bi xebatê bi ser ketibû. b. Ew ji dil de dixebitiya.

32. Di awayê şibandinê de:

a. Azad wek te dixwîne. b. Gul jî wanî dixwîne.

3. Di awayê xurtkirî de :

a. Ev zarok gelek xweşik in. b. Wê derman pir xwariye.

4. Di awayê payedar de :

a. Em ji we pirtir beziyan. b. Hun ji me kêmtir beziyan.

5. Di awayê şanîdanê de :

a. Min guhdarî kir ku wî wiha digot. b. Niha jî ez wisa dibêjime.

6. Di awayê daxwaziyê de :

a. Bila hun ê ji me re bişînin. b. Ma wî negotibû û em jî gelek geriyan.

7. Di awayê gumaniyê de :

a. Dibe ku Dîlan bê cem wan. b. Belkî ew îro nikare bê.

8. Di awayê misogeriyê de :

a. Helbet nikare bê, ew nexweş e. b. Bêguman ew ne li wir e, ez dizanim.

9. Di awayê diyarkirî de :

a. Îro ji ber serêşê, Gul neçû dibistanê. b. Saet, çaryek kêm nehê ne.

10. Di awayê nediyar de :

a. Ew ê rojekê bizivire welatê xwe. b. Şevek ji şevan bû, rêwî dimeşiyan.

11. Di awayê sedemê de :

a. Mem, bo karê xwe sibehê zû hatibû. b. Ew çima dixebitî, qet nedifikirî.

12. Di awayê erêkirinê de :

a. Belê, min dîtina we pejirand. b. Hevalno, hun ser çavan hatine!

13. Di awayê neyîniyê de :

a. Ez ne zû têm, ne dereng dimêm. b. Wan, pirtûk hîn nedane weşandin.

14. Hwd.

Tiştonek

A: Mahir Berwarî

Mihemed Emîn Doskî/Duhok

- Tiştîkê min çar reng e, gelek bi nav û deng e
Li çar parcên welatî, bo wê xebat û ceng e
Kesk û spî sûr li ber, rojeka zer ketî ser
Li hembêza esmanî, yê bilinde her û her
Sûr e nîşana xûn e, kesk e ya xêr û jînê
Spî jî yê aştiyê ye, roj ya hizir û zanînê
Keskusûr e yan tav e, alaye yan gulav e. (* Ala) (36)

- Tiştîkê min û te ye, li ber destê hemiya heye
Di avê da dih`elit, saloxet jê ev e ye
Çi car xo nahebînit, bihay bo xo nabînit
Ji bo mifayê xelkê, herdem xo dih`elînit
Yê giring û erzane, bo paqijya hemya ne
Kesê bikar neînit, ew a`şiqê derda ne

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin

www.arsivakurd.org

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (323)

Wêneyên merasima roja Şehîdên Kurdistanê-Koye

www.arsiwkurd.org